

## Cudatîyê Zimanê Devkî û Nivîskî Di Çarçoveya Berhevkarîya Folklorê Da

Di Kurdî da, zimanê devkî ji gellek alîyan va ji zimanê nivîskî vediqete. Tecrubeya zimanê devkî, ji zimanê nivîskî zêdetir e. Zimanê devkî ev çend hezar sal in li dar e, lê zimanê nivîskî –mirov çend berhemên Kurdî ên sereke bide alîyekî– di vê sedsala bihûrî da derfet bi dest xistîye. Lewma jî gellek tiştên Kurdan, dengî ne û derbasî nivîsê nebûne. Li Bakurê Kurdistanê ev çend salên dawî, hewldana berhevkarîya karê folklorê he ye, lê mixabin di vî karî da pirrî caran qaîdeyên berhevkirina karê folklorê têne pêpeskirin. Yek ji qaîdeya folklorê ya sereke ew e ku divê mirov bi tu awayî dest nede gotina ku tê neqilkirin. Divê mirov tiştinan ji gotinê kêm neke û tiştinan jî li gotinê zêde neke. Ci çawa hatibe gotin, divê wisa bê nivîsîn. Wextê mirov bala xwe dide metnên xebatên folklorîk ên roja me, mirov dibîne bê kîjan peyv û qertaf li gotinan hatine zêdekirin. Ji bo karê berhevkarîyê baş bê kirin divê mirov hay ji cudatîyê di navbera zimanê devkî û nivîskî da he be. Di çarçoveya karê folklorîk da, min bala xwe da gotinê gelî, keresteyên berhevkirî û gellek berheman û min hin cudatîyê zimanê devkî û nivîskî tespît kirin.

### 1. Ketina Dengdêran

Di zimanê devkî da pirrî caran ji bo sivikkirinê dengdêr dikevin. Dengdêra ku herî zêde dikeve “i” ye û ev dengdêr pirrî caran ji kîteya nava lêkera raweyî û ji navdêran dikeve. Bi vî awayî kîteyek kêm dibe û vegotin hêsanter dibe.

1

#### 1.1 Ketina Herfa Navîn

Pirrî caran di peyvîn sê-çar kîteyî da dengdêra kîteya navîn dikeve.<sup>1</sup> Bi vî awayî peyv dibe du kîte û vegotina wê hêsanter dibe.

##### Mînak:

Bigire	Bigre
Digirin	Digrin
Difîrişom	Difroşim
Nemîrim	Nemrim
Birjînin	Birjînin
Nepeyîve	Nepeyve
Nayne	Nayne
Sebîra wan	Sebra wan

<sup>1</sup> Pirr kêm be jî carna herf ji serê peyvan dikevin. “Hewqas-Ewqas-Wiqas”

Bivirê me	Bivrê me <sup>2</sup>
Eviya	Evyâ
Carinan	Carna

## 1.2 Ketina Herfa Raveberê

Wextê di ravekê da veqetandek têr ser peyvên ku herfa wan a dawîyê dengdêr e<sup>3</sup>, herfa dawî ya peyvê dikeve.

**Mînak:**

Axayê we	Axê we
Maseya we	Masa we
Mamosteyê me	Mamostê me
Hesteyê min	Hestê min <sup>4</sup>

## 1.3 Ketina Qertafa Dîyariyê

Qertafa dîyariyê ya nêr, “î” di zimanê devkî da pirrî caran nayê bikaranîn, lê di nivîsê da ji bo zimanekî têkûz tê bikaranîn.

2

**Mînak:**

Hesenî ji min ra got.	Hesen ji mi ra go.
Dîkî ew xwar.	Dîk ew xwar.

## 1.4 Ketina Qertafêñ Veqetandekê

Qertafêñ veqetandekê di zimanê devkî da carna ji peyvê dikevin. Pirrî caran piştî qertafa nenasîyê nayêñ bikaranîn.

**Mînak:**

Hevaleka baş e	Hevaled baş e
Derîyekî xweş	Derîyek <sup>5</sup> xweş
Çû navâ wan	Çû nav wan

<sup>2</sup> Peyvên dukîte yên ku di kîteya wan a dawîyê da herfa “i” yê he ye wextê qertafêñ veqetandekê têr ser wan ew dengdêr dikevin, “sebir > sebra min, debir > debra me”.

<sup>3</sup> Ev deng bêhtir “a” û “e” ne.

<sup>4</sup> Carna di vî awayî da, herdu herfêñ dawîya peyvê jî dikevin, “gunehê min > gunê min”. Ev jî rê li ber tevlihevîyê vedike.

<sup>5</sup> Carna qertaf diguhere û dibe “ik-ik”; “derîyik xweş > derîk xweş”.

## 1.5 Ketina Herfa Qertafa Nenasîyê

Qertafa nenasîyê ya yekjimar “-ek” wextê di axaftinê da tê bikaranîn pirrî caran herfa “e”yê jê dikeve.

### Mînak:

Dare <u>ka</u> mezin	Darka mezin
Roj <u>e</u> kê	Rojkê
Hin <u>e</u> kî	Hinkî
Mêri <u>e</u> kî	Mêrikkî <sup>6</sup>
Jini <u>e</u> kê	Jinikkê
Pano <u>e</u> kî	Panotkî
Qurt <u>e</u> kî	Qurtkî
Rovî <u>e</u> kî	Rovîkî
Tiş <u>e</u> kî	Tişkî

## 1.6 Ketina Qertafa Cînavka Kesîn

Qertafa kesê sisêyan a yekjimar “-e” di zimanê nivîskî da û di dema borî ya têdayî da pirrî caran dikeve. Lê di zimanê devkî da li hin herêman tê bikaranîn. Di kesê diduyan da jî li hin herêman qertafa dawîyê “î” dikeve, lê di nivîsê da tê bikaranîn.

3

### Mînak:

Ew hate <sup>7</sup>	Ew hat
Ew kete	Ew ket
Ew mire	Ew mir
Tu hat <sup>8</sup>	Tu hat <sup>8</sup>

## 1.7 Ketina Qertafa Raweya Fermanî

Di zimanê devkî da, qertafa raweya fermanî ji bo gotin bêhtir sivik bibe carna ji lêkerê dikeve. Di rewşa fermanî da lêker kurt dibe. Di zimanê nivîskî da ev tê parastin.

### Mînak:

Bikuje	Bikuj
Bike	Bik
Bisekin <u>e</u>	Bisekin > Bisek > bise > bis
Bibêje	Bibê > bê
Dibêje	Dibê

<sup>6</sup> Wextê peyv “mêrikek” be, dibe “mêrikki”. Qertafa “î”yê bivênevê lê zêde dibe.

<sup>7</sup> Di zimanê nivîskî da ev qertaf nayê tercîhkîrin, rê li ber tevlihevîya raweyê deman vedike.

<sup>8</sup> Ev awa, li herêma Mêrdînê he ye.

## 1.8 Ketina Herfêن Qertafêن Deman

Pirrî caran di zimanê devkî da, di dema niha da, herfa qertafa demê “i” wextê ku berî dengdêreka dirêj bê dikeve. Herweha di neyînîya dema raweyê da jî “e”ya qertafa neyînî dikeve.

### Mînak:

D <i>ı</i> avêje	Davêje/Davê
D <i>ı</i> axive	Daxive
D <i>ı</i> êşe	Dêşe/Têşe
Neavêje	Navêje
Neajo	Najo

## 1.9 Ketina Herfa Daçekan

Di cînavkên lihevxitî da, carna dengdêra daçekê dikeve û gotin hinekî din jî kurt dibe.

### Mînak:

Ew pê <i>r</i> a çû.	Ew pê’r çû
Ji min <i>r</i> a nebêje.	Ji mi’r nebêje.

L <i>i</i> hev	Lev
J <i>i</i> hev	Jev
B <i>i</i> wê/wî	Pê
J <i>i</i> wê/wî	Jê

## 2. Ketina Dengdaran

Di zimanê devkî da pirrî caran ji bo sivikkirinê dengdara li dawîya peyvê dikeve. Herfêن “h, t, n, k,”ê hinek ji wan herfan in. Lê bêhtir herfa “h” û “n”yê ji dawîya peyvan dikevin.

### Mînak:

Min <i>g</i> ot	Mi go
Hevalan <i>d</i> a	Hevala da
Li ser çava <i>n</i>	Li ser çava
Sê çar cara <i>n</i>	Sê çar cara
Her duyan <i>n</i>	Herduya
Yan <i>t</i> u yan <i>e</i> w	Ya tu ya ew
Carinan <i>d</i> içû	Carna diçû
Were ba <i>w</i> î	Were ba wî
Dît	Dî
Didît	Didî

Destmêj	Desmêj
Dest pê kir	Des pê kir
Guneh e	Gune ye
Qaneh bû	Qane bû
Neh kes bûn	Ne kes bûn
Wela <del>h</del> / Wele <del>h</del>	Wela / Wele
Zarok	Zaro
Limêj	Limê
Ya ku	A ku
Ez dibêm	E dibêm
Çiqas lazim e	Çiqa lazim e
Xerab bû	Xera bû
Ez diçim	E diçim

## 2.1 Ketina Herfa Qertafa Veqetandekê

Herfa qertafa veqetandeka pirrjimariyê “n” li dawîya peyvan e û pirrî caran di zimanê devkî da dikeve û nayê gotin.

### Mînak:

Darê <del>n</del> wan jêkirin.	Darê wan jêkirin.
Çiyayê <del>n</del> me bilind in.	Çiyayê me bilind in.
Ê <del>n</del> xweşik ew in.	Ê xweşik ew in.
Derman bixe çavê <del>n</del> xwe	Derman bixe çavê xwe.
Li ser çavê <del>n</del> min	Li ser çavê min

## 2.2 Ketina Herfa Qertafa Dîyarîyê

Herfa qertafa dîyarîyê ya pirrjimar “n” di zimanê devkî da pirrî caran dikeve û nayê gotin.

### Mînak:

Hevalan <del>n</del> deng nekir.	Hevala deng nekir.
Cotkaran <del>n</del> cotê xwe kir.	Cotkara cotê xwe kir.
Darê <del>n</del> gûza <del>n</del> mezin in.	Darê gûza mezin in.
Mala zarokan <del>n</del> vala bû.	Mala zaroka vala bû.

## 2.3. Ketina Herfa Paşdaçekê

Wextê ku cînavk dikevin nava daçekan, carna herfa dengdar a daçekê dikeve, herfên cînavkê jî dikevin û herfa dengdêr a daçekê bi cînavkê va tê nivîsîn.

### Mînak:

Ji <u>min</u> <u>ra</u> got.	Ji ma got.
Ji <u>te</u> <u>ra</u> dibêjim.	Ji ta dibêjim.

## 2.4 Ketina Herfêن Kîteyan

Carna ji bo rewanbêjîya gotinê du herf bi hev ra ji peyvê dikevin. Ev yek bêhtir di lêkeran da û di nava peyvê da çêdibe.

### Mînak:

#### Ji lêkeran

Rad <u>ih</u> êje	Radêje
D <u>ih</u> êm	Têm
N <u>ih</u> êrî	Nêrî
B <u>in</u> ihêre	Binêre
D <u>ig</u> ihiâne	Digîne
D <u>i</u> here	Dere
N <u>a</u> here	Nare
N <u>e</u> hat	Nat.
Nizan <u>im</u>	Nizam
Tune <u>ye</u>	Tune
Tu b <u>uya</u>	Tu ba

6

#### Ji Navan

<u>H</u> işyar	Şiyar
Vê <u>sib</u> ê	Vê sê
Malê diny <u>yay</u> ê	Malê dinyê/dinê
Xwe <u>ha</u> wê	Xwa wê

## 3. Ketina Pêşdaçekan

Di daçekan da pirrî caran pêşdaçek dikeve.<sup>9</sup> Hin caran paşdaçek jî dikeve. Di cînavkên lihevxitî da dengê herfa daçek û cînavkê dikeve.

### Mînak:

<u>B</u> i paş da hat.	Paş da hat.
<u>B</u> i qasî te xwar.	Qasî te xwar.
<u>D</u> i ser ra girt.	Ser ra girt.

<sup>9</sup> Carna herfa daçekê ji bo sivikkirinê dikeve, “Ha l’ nav dara...”

<u>Bi</u> ser da çû.	Ser da çû.
<u>Bi</u> şûn da hat	Şûn da hat.
<u>Bi</u> wê da çû	Wê da çû.
<u>Di</u> vir da hat.	Vir da hat.
<u>Li</u> ser çavê min	Ser çavê min
<u>Bi</u> xêr hatin	Xêr hatin
Ber bi malê çû	Ber bi malê <u>va</u> çû
Dar di şorbeyê kir	Dar di şorbeyê <u>da</u> kir
<u>Ji</u> <u>wê</u> hez kir	Jê hez kir
<u>Li</u> <u>wê</u> nihêrî	Lê nihêrî

#### 4. Ketina Qertafa Demê

Qertafa dema niha “di” di lêkerên “zanîn” û “karîn”ê da û qertafa dema bê û raweyên xwestekê “bi”, di zimanê devkî da pirrî caran ji lêkerê dikeve.

##### Mînak:

<u>Dikarim</u>	Karim
<u>Dizanim</u>	Zanim
Dê çê <u>bibe</u>	Dê çêbe
Dê çê <u>bike</u>	Dê çêke
Lê <u>bike</u> ve	Lê keve
Jê <u>bike</u>	Jê ke
Kerem <u>bike</u>	Kerem ke

7

#### 5. Guhertina Dengê Daçekan

Di paşdaçekan da bi pirranî herfa “a”yê he ye, klasîkên me, keresteyên folklorîk û gellek kes paşdaçekan bi “a”yê bi lêv dikan, li hin deverên Mêrdînê û li alîyê Rojavayî hin dever carna bi tenê “r”yê bi şid dibêjin carna *nîv*-“e”yêkê lê zêde dikan.<sup>10</sup> Di zimanê nivîskî da herdu awa jî he ne.

##### Mînak:

Di vir <u>da</u>	Di vir di	Di vir <u>d<sub>e</sub></u>
Di wir <u>ra</u>	Di wir ri	Di wir <u>r<sub>e</sub></u>
Bi vir <u>da</u>	Bi vir di	Bi vir <u>d<sub>e</sub></u>
Bi wir <u>va</u>	Bi wir vi	Bi wir <u>v<sub>e</sub></u>

<sup>10</sup> Ji bo agahîyên zêdetir, <http://www.amidakurd.net/pel/Pirsgirêka-Dengê-Daçekan.pdf>

Bi min <u>r</u> <u>a</u>	Bi min ri	Bi min <u>r</u> <u>e</u>
Ji min <u>r</u> <u>a</u>	Ji min ri <sup>11</sup>	Ji min re
Ji wir <u>v</u> <u>a</u>	Ji wir vi	Ji wir <u>v</u> <u>e</u>
Ji wir <u>d</u> <u>a</u>	Ji wir di	Ji wir <u>d</u> <u>e</u>

## 6. Guhertina Veqetandekê

Qertafa veqetandekê ya mêt “a” wextê ku piştî qertafa nenasîyê tê di zimanê nivîskî da dibe “e”. Qertafa veqetandekê ya nêr “ê” piştî qertafa nenasîyê dibe “î”. Qertafa veqetandekê ya pirrjimariyê “ên” jî piştî qertafê nenasîyê di zimanê nivîskî da dibe “ine”. Lê di zimanê devkî da pirrî caran ev ne wisa ye. Li hin herêmên Behdînan jî veqetandeka pirrjimariyê “ên” dibe “êd-êt”. Herweha bê qertafa nenasîyê jî carna qertafa veqetandekê “ê” dibe “î”.

Mînak:

### Piştî Qertafê Nenasîyê

#### Yekjimar

Hevalek <u>a</u> min	Hevalek <u>e</u> min
Darek <u>a</u> mezin	Darek <u>e</u> mezin
Hevalek <u>ê</u> min	Hevalek <u>î</u> min
Mêrikek <u>ê</u> dîn	Mêrikek <u>î</u> dîn

#### Pirrjimar

Hevalin <u>ên</u> min	Hevaline <u>r</u> <u>e</u> min <sup>12</sup>
Darin <u>ên</u> min	Darine <u>r</u> <u>e</u> min

Hîn <u>ê</u> min	Hîn <u>î</u> min
Pişt <u>ê</u> min	Pişt <u>î</u> min
Rast <u>ê</u> min hat	Rast <u>î</u> min hat
Hember <u>ê</u> min	Hember <u>î</u> min
Hevalê min <u>ê</u> rind	Hevalê min <u>î</u> rind
Heval <u>ên</u> min	Heval <u>êd</u> min

## 7. Guhertina Qertafê Cînavkên Kesîn

Di zimanê nivîskî da qertafa kesê sisêyan “e” ye, ev qertaf di zimanê devkî da carna diguhere dibe “i” li hinek herêman dibe “a” û “o” û “ê”. Herweha li hinek herêman qertafa pirrjimariyê “in” jî dibe “î”. Li hin herêmên Behdînanê “e” bi awayê “it”ê ye.

<sup>11</sup> Li herêma Mêrdînê pirrî caran dengê “e” yê li paşdaçekan nayê zêdekirin bêhtir “r” bi şid tê gotin. Ji mi ‘r gotin.

<sup>12</sup> Di vî awayî da peyva “hin”ê tê bikaranîn. “Hin hevalên min.”

## Mînak:

### Kesê Sisêyan (*e-i*) (*e-a*) (*e-o*) (*e-ê*)

Çêdik <u>e</u>	Çêdik <u>i</u> > Çêdik <u>a</u>
Dixw <u>e</u>	Dixwi <u>i</u> > Dixw <u>a</u>
Did <u>e</u>	Did <u>i</u>
Dinêr <u>e</u>	Dinêr <u>i</u>
Jê k <u>e</u>	Jê k <u>i</u>
He y <u>e</u>	He y <u>i</u>
Dixw <u>e</u>	Dixwa <u>a</u>
Diç <u>e</u>	Diç <u>o</u>
Rûdin <u>e</u>	Rûdinê <u>â</u>
Dirêj <u>e</u>	Dirêjê <u>ê</u>

### Kesê Sisêyan (*e-it*)

Dib <u>e</u>	Dib <u>it</u> <sup>13</sup>
Diç <u>e</u>	Diç <u>it</u>

### Kesê Pirrijimar (*e-i, in-i*)

He ne <u>e</u>	He ni <u>i</u>
Em biç <u>in</u>	Em biç <u>î</u>

### Kesê Diduyan (*e-i*)

Tu hatîy <u>e</u>	Tu hatîy <u>i</u>
-------------------	-------------------

9

## 8. Guhertina Cînavkan

Herçiqas di zimanê nivîskî da cînavk dîyarkirî bin jî, li gorî hin herêman awa û dengên cînavkan diguherin.

## Mînak:

Tu	Tû/Ti
Wê <sup>14</sup>	Ewê
Wî	Ewî
Wan	Ewan
We	Hewe
Hûn	Win

## 9. Guhertina Qertafa Dîyarîyê

Di zimanê devkî da carna qertafê dîyarîyê ji dêvila hev têن bikaranîn. Ev bêhtir piştî qertafa nenasîyê “-ek”ê û ji bo gotinê sivik bike tê kirin.

<sup>13</sup> Ev awa, li Botan û Behdînan he ye.

<sup>14</sup> Di ravekê da carna cînavk dikeve û herfa “y”yê li peyvê tê zêdekîrin, “mala wi” dibe “mala’y”

**Mînak:**

Rokê	Rokî
Jinikkê	Jinikkî
Darkê	Darkî
Malkê	Malkî

**10. Guhertina Dengdêran**

Di hinek peyvan da li gorî herêman hin dengdêr diguherin, di zimanê nivîskî da ji ber ku rûbereka rastnivîsê tune ye, ev pirsgirêk çareser nebûye, dengdêren ku diguherin ev in: “a-e”, “u-i”, “e-i”, “u-û”, “i-î”, “û-î” ...

**Mînak:**

Derve	Derva
Zira <sup>a</sup> et	Ziri <sup>i</sup> et
Cima <sup>a</sup> et	Cimi <sup>i</sup> et
Sîwar	Sîyar
Mela	Mele
Parçe	Perçe
Şîkur	Şukur/Şikir
Wînda	Wenda
Xelas	Xîlas
Xerab	Xîrab
Çî ye	Çî ye
Hînkî	Hînkî
Tu kes	Tî kes
Meriv	Mîrov
Herd <u>u</u>	Herdû
Hevd <u>u</u>	Hevdû
Hemû	Hemî
Malek	Malîk
Hevalîk	Hevalek
Hesab	Hîsab
His	Hes
Tijî	Tije/Tejî
Pênce	Pêncî
Jîjo	Jûjî
Xwe	Xwu/Xo/Xu
Fayde	Feyde
Nîkul	Nûkul
Hundîr	Hundûr
Rûvî	Rêvî/Rovî
Wîha	Wîha
D <u>u</u> meriv	Dî meriv

Bûye	Bîye
Çûye	Çîye
Dişkêne	Dişkîne
Distêne	Distîne
Dixwêne <sup>15</sup>	Dixwîne
Bihatîma	Bihatama
Biçûma	Biçama
Ez bûma	Ez bama.

## 11. Guhertina Dengdaran

Di hinek peyvan da li gorî hin herêman dengdar guherîne. Hin dengdarên ku diguherin ev in: “b-v” “b-p” “h-w” “d-t” “n-l” “f-v” “d-t” “s-s”.<sup>16</sup>

### Mînak:

Dibîne	Divîne
He bû	He yû
Bîye	Vîye
Bira be	Bira ye
Sibê	Siyê
Mirtib	Mirtiy
Nod	Not
Biçûk	Piçûk
Bîra	Bila
Diîne	Tîne
Dadîine	Datîne
Dajo	Tajo
Dianî	Tanî
Diavêje	Tavêje
Serjêkirin	Serjêkirin
Hûn	Win/Wûn
Tu kes	Çu kes
Xweyî	Xwedî
Nimêj	Limêj
Hebkî	Heykî
Wunda	Hunda
Zeft	Zeyt
Tiyîng	Tifing

<sup>15</sup> Şikandin, standin, xwandin. Di van lêkeran da dengê ku hatîye guhertin “a” ye. Lê ji ber ku “a”ya wan hêdî hêdî bûye “e” di dema niha û raweyên din da “ê” bûye “î”.

<sup>16</sup> Dengê rayekên lêkeran jî li gorî deman diguherin, “axaftin > diaxivim, kuştin > dikujin”

## 12. Guhertina Qertafêن Lêkerçêker

Di dema borîya têdayî da du awayên lêkeran derdikeve holê, hinek herêm qertafa “*i*”yê bi kar tînin hinek herêm jî “*iya*”yê. Di zimanê nivîskî da bêhtir awayê “*iya*”ê tê bikaranîn.

### Mînak:

Ez <u>jî</u> -m	Ez <u>jîya</u> -m
Ew ger <u>i</u>	Ew ger <i>iya</i>
Ew fir <u>i</u>	Ew fir <i>iya</i>

## 13. Guhertina Qertafa Neyînî

Di raweya fermanî da, qertafa neyînî bi pirranî “*me*” ye. Lê di nivîsê da gellek caran “*ne*” tercîhkîrin.

### Mînak:

<u>Me</u> çe	<u>Ne</u> çe
<u>Me</u> xwe	<u>Nex</u> we

## 14. Racivîn

12

Ziman, her ku diçe barê xwe sivik dike û rewan dibe. Ji bo herikbarî û kurtbûnê, hinek kîteyên peyvan cîyên xwe didin dengdêrên dirêj, ji vê yekê ra racivîn tê gotin. Racivîn di zimanê nivîskî û devkî da, di herdulan da jî bi cî bûye. Lê meyla zimanê nivîskî ne li ser racivînê ye.

### Mînak:

<u>Guh</u> ê wî	<u>Goy</u> ê wî
<u>Du</u> ht	<u>Dot</u>
<u>Gu</u> htin	<u>Gotin</u>
Xwe <u>yî</u> yê wî	Xwe <u>yî</u> yê wî
<u>Lew</u> ma	<u>Loma</u>
<u>Bil</u> hurîn	<u>Bor</u> rîn
<u>Bil</u> hust	<u>Bost</u>
R <u>ih</u> nî	R <u>on</u> î
<u>Deh</u> nû	Danû
F <u>ah</u> m	Fêm
K <u>eh</u> nî	Kanî
<u>Key</u> f	Kêf
M <u>eh</u> van	Mêvan
Sib <u>eh</u>	Sibê

Dihin	Dîn <sup>17</sup>
Gilih	Gili
Strih	Strî
Tirih	Tirî
Pêçih	Pêçî
Rihtin	Rîtin
Sihet xwes	Siet xwes
Gwin	Gûn
Gwiz	Gûz
Kwîr	Kor
Kwîz	Kûz
Swind	Sond
Xwar	Xor

## 15. Guhastina Dengdaran

Di guhastinê da, dengdarên nava peyvê cî diguherînin. Awayêney peyvan ên rast li gorî hinek herêman guherîne. Bêhtir herfa “r”yê bi herfêne din ra cî diguherîne.

### Mînak:

Mirtib	Mîrib
Binêre	Birêne
Ciran	Cînar
Nihêrt	Rihênt
Derva	Devra
Berf	Befr
Derwêş	Dewrêş
Desgirtî	Dergistî
Hervîsim	Heyrîsim
Se dem	Semed
Serpeze	Şepirze
Şarwal	Şalwar

13

---

## 16. Pêkhatina Herfa Dengdar

Ji bo cînavkên kesîn ên yekjimar, gellek caran ji bo rewanbêjîyê típa “w”yê li serê peyvan tê zêdekirin.

### Mînak:

W'ez	ê biçûma wan dîyaran.
W'em	ê vî tiştî ji bîr nekin.
Emînê Wehmed	digo lê lê Besnayê

---

<sup>17</sup> Dengdêren kurt gellek caran li dû dengdêren dirêj nayêni bikaranîn.

## 17. Guhertina Dengdarêن Alîkar

Dengdarên alîkar “w,h,y” gellek caran dikevin nava du dengdêran û vegotinê hêsan dikin. Di warê nivîskî da ji van dengan a ku herî pirr tê bikaranîn “y” ye. Lê di zimanê me da awayê din jî he ne. Di zimanê nivîskî da, di hinek peyvan da jî tîpa alîkar “h” hatîye tercîhkirin.

### Mînak:

Gerî~~y~~am Gerîham.

Her dû~~y~~an Her di~~w~~an

Ronahî Ronayî

Ava~~h~~î Avayî

Perwerde~~h~~î Perwerdeyî

## 18. Tewang

Peyvên nêr, ên ku dengêن “a-e”yê dihewînin, ji hundirê xwe tên tewandin. Ev awa li gorî hin herêman diguhere. Di zimanê nivîskî da jî divê ev awa bê bikaranîn.

14

### Mînak:

Ez mast dixwim. Ez mêt dixwim.<sup>18</sup>

Ew nan tîne. Ew nêñ tîne.

### Çavkanî:

- Berhevkarîyêن Folklorîk Ên Neçapkirî
- Borak Mustafa, Gotinê Pêşîyêن Kurda, Weşanêن Berfinê, Stenbol, 1996
- Bozarslan, M. Emîn, Ilmê Tûrik, Weşanêن Dengê, Stenbol, Çirîya Pêşîn, 2011
- Bozarslan. M. Emîn, Mela Kulî, Weşanêن Dengê, Amed, 2013
- Cegerxwîn, Hêvî, Aşîtî, Şefaq, Weşanêن Roja Nû, Stockholm, 1982
- Hawar, Kovar 2 cîld, Weşanêن Nûdemê, Stockholm, 1998.
- Kolo, Ebdullah Elî, Pendêñ Kurdî, Weşanxaneya Batmane, Stenbol, 2014
- Lescot, Roger, Memê Alan, Weşanên Avestayê, Stenbol, 2010
- Kürtçede Ses Değişimi, Weşanên Vateyyê, Stenbol, 2013
- Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Zargotina Kurda I-II, Weşanên Aramê, Stenbol, 2013
- Ronahî, Kovar, Weşanên Belkîyê, Stenbol, 2010.

Bahoz Baran

<sup>18</sup> Hinek, vê dîyarkirinê bi qertafan çedikin. Ez mastî dixwim.